# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 950 | 20-Adar- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî



**Navnîşan**

www.ronahi.net/ku/

nameronahi@gmail.com

@rojnameyaronahî

+963 052 423165

423165

+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني


## Newroz û çîpsên kartolan

**Bihizirin şirketeke çîpsên kartolan ya Emerîkî bi hatina Newrozê re li ser pakêtên xwe “Newroztan pîroz” dinivîse û li binê nivîsê jî wêneyên sembola seyrana Newrozê bi kar tîne.**

Bihizirin şirketeke çîpsên kartolan a Emerîkî bi hatina Newrozê re li ser pakêtên xwe “Newroztan pîroz” dinivîse û li bin nivîsê jî wêneyên sembola seyrana Newrozê bi kar tîne. Li Başûrê Kurdistanê markeyeke çîpsan vê dike. Bazara pereyan tiştekî weha ye. Li kesî nayê rehmê. Gava tu bi kartolên ser erda xwe çîpsên tahmxweştir, bi sihettir çênekî, li ser wan jî li gorî dilê xwe Newrozê pîroz nekî, wê markeya ku şirketeke li Nashivillê xwediyê wê ye, bi çend reklamçêkeran malê xwe bifiroşe te. Lê dîsa jî çêtir e ji xwarin û kirrîna malên Tirk.

***Ozgûr Polîtîka***




## Bangawaziya HDK’ê ya ji bo Newrozê: Dem dema mezinkirina têkoşînê û serkeftinê ye

**Hevberdevkê HDK’ê Cengîz Çîçek diyar kir ku li Tirkiyeyê têkoşîna yekbûyî êdî pêdivîyek bivê nevê ye û got: “Lewma niha dem dema zexmkirina berxwedanê û serkeftinê ye.”**

Newroza Stenbolê îsal dê bi pêşengiya Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK) bi dirûşmeya “Dem dema serkeftinê ye” li Qada Yenîkapiyê bê pîrozkirin. Li bajêr xebatên ji bo pîrozbahiyê bênavber didomin. Hevberdevkê HDK’ê Cengîz Çîçek, destnîşan kir ku Newroza 2022’yan xwedî girîngiyeke dîrokî ye û rasterast girêdayî geşedanên li cîhanê ye û lewma divê her kes berê xwe bide qada Newrozê.

**Starta komara demokratîk**

Çîçek, destnîşan kir ku desthilata AKP-MHP’ê di nava krîzekê de ye û sedemeke sereke ya vê krîzê jî têkoşîna wan a civakî ye. Çîçek got: “Em xwedî hêzeke civakî û polîtîk in û me bi vê têkoşînê desthilata AKP-MHP’ê pir tengijandiye. Lewma em dibêjin ‘dem dema serkeftinê ye.’ Belê, em faşîzmê dihejînin, em li Tirkiyeyê denklema siyasetê diguherînin. Em pêvoya Newrozê û 1’ê Gulanê wekî starta pêvajoya avakirina komara demokratîk jî dibînin ku dê ev yek faşîzmê têk bişikîne.”

**‘Pêşengê Newrozê Ocalan’**

Çîçek, bibîr xist ku dê di Newroza 2022’yan de daxwaza ji bo azadiya Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan bê bilindkirin û got: “Pergala tecrîd û îşkenceyê ya Îmraliyê ya li hemberî Birêz Ocalan, a rast bi feraseta rêvebiriya faşîst a AKP-MHP’ê re eleqedar re. Çima Birêz Ocalan hedef tê girtin? Ji lew re Birêz Ocalan bi fikirê têkoşîna civakî ruhekî li Newrozê bar kiriye, pêşengtiya têkoşîna civakê dike. Lewma ev tecrîd rasterast ne bi Birêz Ocalan, ji ber fikirên wî ne.”

Çîçek destnîşan kir ku Newroz ji bo wan tenê ne mîtîngek û rojek e û got: “Newroz bîra têkoşînê, hişmendiya têkoşînê ye. Agirê serîhildanê yê Kawayê Hesinkar û agirê ku niha karker di grevan de vêdixin heman agir e. Agirê kesên li çiyayên KAzê li ber xwe didin û agirê Kawayê Hesinkar ji hev ne cuda ne. Lewma divê em ji vir dest pê bikin û agirên serîhildanan, agirê berxwedanan bînin cem hev du û veguherînin têkoşîneke civakî ku rejîmê û aqilê faşîst bibizdîne.”

**Li qadên newrozê mil bi mil**

Çîçek, destnîşan kir ku divê hemû gel, hemû nasnameyên bindest li qadên Newrozê bên cem hev du û li dijî faşîzmê hêrsa xwe bînin ziman û got: “Gel divê li qada Newrozê wêneyê neserîtewandinê bidin der. Li her derî berxwedan heye. Pêdivî bi anîna cem hev a van berxwedanan heye. Lewma qada Newrozê di warê dîtina zeximbûn û mezinbûna destkeftî û têkoşîna me ya civakî de girîng e. Ger Newroz agirê serîhildanê yê gelan be, nexwe divê hemû kesên ehlê jiyanê, li fabrîkeyan, li dibistanan, li tevahiya qadên jiyanê li qada Newrozê bibin yek beden û bên cem hev du.”

**‘Em ê bi hev re bi ser bikevin’**

Çîçek, diyar kir ku têkoşîna yekbûyî êdî pêdiviyek e û got: “Te dît, em tim dibêjin ‘xelasiya bi
tena serê xwe tune ye.’ Bi rastî jî niha em mecbûr in bên cem hev û bi hev re bi ser bikevin. Di vir de tenê wê kesek bi ser nekeve, em ê




bi bi hev re bi ser bikevin. Hêzên li hemberî me tevahiya lîstikê bi vî awayî dilîzin. Lewma em dibêjin tifaqa bindestan, tifaqa Rêya Sêyem a li dor HDK û HDP’ê kom bûye, gelek destkeftî bi dest xistine. Sedema êrişên li hemberî me ev destkeftî ne. Tekane rêya berterefkirina vê êrişê jî destpêkirina pêvajoya rewa ya demokratîk e. Em ê ne bi parastinê, bi pêngavan vê yekê bikin.”

**`Dem dema mezinkirina berxwedanê ye`**

Çîçek di dawiya axaftina xwe de got: “Newroz ji xalên navendî yên herî biqîmet ên vê pêvajoya pêngavî ye. Me bi têkoşîna xw ekîmyaya desthilatê xera kir. Me li Tirkiyeyê çarenivîsa xw eya bêyom guheand. Me têkildarî pêşeroja demokratîk a gelan selek serkeftinên mezin bi dest xistin. Êdî pêvajoya parastina destkeftiyan û avakirina rêxistinbûyîna civakî ya demokratîk e. Lewma niha dem dema mezinkirina têkoşînê, dem dema serkeftinê ye.”

***MA / Ferhat Çelîk***

## Eşantiyona ku NASA berî 50 salî ji heyvê anîbû vekir



**Misyonên Apollon yên di çarçoveya ajansa fezayê ya Emerîkî NASA de bi giştî 2196 mînakên şkêran anîbûn cîhanê. Yek ji mînakên ku 50 sal beriya niha anînîbûn bi saya pêşketinên nû yên teknolojîk ji bo lêkolînê hatin vekirin.**

NASA hin eşantiyonan ji bo ku bikare di çarçoveya pêşkeftinên teknolojîk ên herî dawî lêkolîn bike sergirtî hiştibûn.

Li gorî daxuyaniya çapemeniyê ya rêveberê beşa Zanistên Gerstêrkan a NASA’yê Lorî Glaze dabû de got NASA “dizanîbû ku zanyarî û teknolojî wê pêş bikeve û wê bihêle zanyar bi awayên nû materyalan bixwînin û bersiva pirsên pêşerojê bidin.”

Mînaka bi navê “73001”, di Kanûna 1972’an de di dema mîsyona Apollo 17 de ji aliyê astronot Eûgene Cernan û Harrîson Schmîtt ve hate berhev kirin. Boriya 35 cm dirêj û 4 cm fireh ku mînaka ji Heyvê tê de bû, li zemîna geliyê Toros-Lîttrow hate çikandin.

Ji du mînakên ku li ser Heyvê hatine mohrkirin mînaka yekemîn hate vekirin. Tê gotin ku di mînakê de dibe ku gaz an maddeyên hilbar (av, karbondîoksît, hwd.) hebe.

Van gazên ku dibe di mîqdarên pir hindik de hebin, tê xwestin ku bi teknîkên spektrometrî yên ku di van salên dawî de pir hesas bûne werin derxistin û analîz kirin.

Di destpêka meha Sibatê de, lûleya parastinê ya ku mînak tê de ye, destpêkê hate rakirin. Derket holê ku gaza heyvê tê de tune ye, ev tê vê wateyê ku mînaka ku tê de bi rastî sergirtî maye.

Piştre di 23’ê Sibatê de, ji bo ku boriya sereke kun bike û gaza li hundur kom bike pêvajoyek çend hefteyî destpê kir.

Di biharê de, wê şkêr bi baldarî were derxistin û perçekirin da ku ji hêla tîmên zanistî yên cihêreng ve were lêkolîn kirin.

Herêma ku ev mînak lê hatiye girtin, ji ber ku li herêma navborî şemitînek çêbûye, gelekî balkêş tê dîtin.

Ligel vê yekê, alîkara kuratorê Apollo Jûlîane Gross dibêje, “Li ser Heyvê baran nabare û em bi rastî fam nakin ka li wir şemitîna axê çawa çêdibe.”

Piştî eşantiyona “73001” hîn sê mînakên din ên Heyvê yên mohrkirî hene.

***ANF***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Bendav | Ji bo komkirina avê, avdan û kehrebeyê benda li ser çemê avê hatî çêkirin. Sed. |
| Dirav | Pere. |
| Girav | Erdê hawîrdorê wî bi avê hatî pêçan. Cezîre. |
| Eger | 1. Ku: Ku tu neyî ez jî naçim. 2. Sedem: Dewletê egera bihakirina benzînê diyar kir. Divê em şehîdan bikin egera xurtkirina têkoşînê. |
| Jineolojî (Fransî) | Zanista jinê. |
| Peyman | Lihevkirin. |
| Pênase | Danasîn, te’rîf. |
| Piyale | Qedeh, berdaq. |
| Sinc | Exlaq. |
| Xwerek | Tiştên hişk yên dibin xwarin: Birinc, nok, nîsk û hwd. |

## Xaçepirs

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | ■ | | | | |
| 2 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 3 | | | ■ | | ■ | | | | ■ |
| 4 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 5 | | | ■ | | ■ | | ■ | | |
| 6 | | ■ | | ■ | | | | ■ | |
| 7 | | | | | | ■ | | | |
| 8 | | ■ | | | ■ | | | | ■ |
| 9 | | | ■ | | | | ■ | | |

### Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | L | A | M | ■ | A | X | ■ | D | E |
| 2 | I | R | ■ | S | E | Î | D | ■ | T |
| 3 | ■ | Î | R | O | ■ | V | ■ | B | Ê |
| 4 | N | ■ | A | R | Z | E | B | A | ■ |
| 5 | A | V | ■ | A | ■ | T | ■ | G | A |
| 6 | M | ■ | K | N | K | ■ | R | E | ■ |
| 7 | E | N | Î | ■ | A | B | O | R | Î |
| 8 | ■ | Î | ■ | E | N | A | M | ■ | S |
| 9 | A | R | D | ■ | Î | ■ | A | L | A |

**ÇEP-RAST**

1. Bireke pez ya ji 100 hebî heta 200’î... Bajarekî me
2. Kurteya ajansa nûçeyan ya Firatê
3. Rêxistina polîsan a Naziyan... Qumaşê ji hiriyê çêdibe
4. Mehek... Pêxemberek
5. Baneşana bêhntengiyê... Baneşana keserê
6. Cure, celeb
7. Bajarekî Tirkiyê... Lewaz
8. Nexweşiyek... Heyf
9. Qewmê ji bo ku guh nedaye pêxemberê xwe Hûd ji hêla Xwedê ve hatiye tinekirin... Dar yan jî hesinê ku datînin ser stûyê ga ku pê erebe dikişandin yan jî cot dikirin... Kurteya elementa Aktînyûmê

**JOR-JÊR**

1. Şexs... Berhema şanogeriyê ya bimûzîk
2. Madeya ku ji hêmanekê tenê pêk hatiye
3. Yezdanekî misrî... Xwîşka bavê mirov
4. Beşer, mirov... Xwarina sereke
5. Tîpên navî yên “saet”ê
6. Cînava şexsê sisian ji bo rewşa netewandî... Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê
7. Di dereke robarê de di saniyeyê de hecma herikîna avê... Sedemkarê tevgerê, paldêr
8. Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wek sembola hêzê bi kar tînin... Beyreq, sembola welatan
9. Notayek... Cihê ku xwarina heywanan tê de tê danîn

## NEWROZ TAVA ROJÊ YE, PKK JÎ PARTİYA NEWROZÊ YE

Newroz çi ye? Kulîlka derdikeve û tava rojê ye; Sekna jiyanê ye, vebûna rengaleya xwezayê ye û dayîna xwînê ye, ji tevayiya rayên jiyanê re. Va ye PKK jî wisa ye. Bi rastî jî PKK partiyeke Newrozê ye. R-4




# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 950 | 20-Adar- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî





## Berxwedana Serdemê stasyona gelan ye herî binirx e

Evîn Yûsiv: Vîna gelê Efrînê ji azweriya Erdogan mezintir e û himbêzkirina Berxwedana Serdemê bersiva gelê Efrînê ya li hemberî faşîzma Tirkan û çeteyan bû. R-2

# NEWROZ SERHILDANA AZADIYÊ YE



# Berxwedana Serdemê stasyona gelan ye herî binirx e

## Evîn Yûsiv: Vîna gelê Efrînê ji azweriya Erdogan mezintir e û himbêzkirina Berxwedana Serdemê bersiva gelê Efrînê ya li hemberî faşîzma Tirkan û çeteyan bû.

**Jiyan Ebas-Qamişlo**

Di dîrokê de gelek tabloyên berxwedanê li ser dîwarên şkeftan hatine nexişandin. Serdestan her hewl daye ku têkoşîna gelan ya li hemberî zilm, stemkarî, kedxwarî û dagîrkeriyê binixumînin, vala û bêwate bikin. Lê dîsa jî şêwazê veguhestin û nivîsandina serpêhatiya vê dîrokê rêbazeke gelan ya berxwedan û têkoşîna ber bi azadiyê ve ye. Berxwedana Serdemê ya li hemberî dagîrkirina Efrînê yek ji stasyonên gelan ya herî binirx û giranbiha ye. Bi qulibandina rûpelên dîrokê û lêgerîna li mînakên vê berxwedanê re, ancax tenê Çiyayê Kurmênc cewherê vê berxwedanê vebêje. 58 rojan ciwan, jin, kal, pîr û zarokên Efrînê û tevahî Rojava û Kurdistanê li hemberî daneheva kirêt ya hişmendiya dagîrker li ber xwe didan.

Taybetmendiya Berxwedana Serdemê ew e ku daneheva têkoşîna gelan ya meşa ber bi azadî û nirxên civakbûyînê ye. Ango di şexsê vê berxwedanê de dîrokê, rûpelên xwe yên doza moderniteyê girtine, dadiweşandin û kêliyên xwe yên spî û xweşik bi dunyayê re parve dikir. Ji ber vê yekê jî, şiklê êrîşan komplowarî bû. Ev çar sal in di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibin.

### 'Bersiv Berxwedana Serdemê bû'



Derbarê mijarê de endama kordînasiyona giştî ya Kongreya Star Evîn Yûsiv ji rojnameya mere axivî û ev nirxandin kirin: "Efrîn di encama komployeke navneteweyî de hat dagîrkirin. Çek û cebilxaneya ku li dijî gelê Efrînê hatiye bikaranîn; teknîka herî pêş ya NATO`yê bû. Sazî û rêxistinên navneteweyî jî çavên xwe li hemberî vê hovîtiya faşîzma Tirkam girtin. Tirkiyê û piştevanên wê xwestin îradeya gelê Kurd li Efrînê bişkînin. Dîktatorê Tirk daxuyanî didan û dilê xwe xweş dikir ku wê di sê rojan de Efrînê dagîr bike. Lê vîna gelên Efrînê ji azweriyên Erdogan mezintir bû. Hembêzkirina Berxwedana Serdemê bersiva gelên Efrînê ya li hemberî faşîzma Tirk û çeteyan bû. Tirkiyê û çeteyên wê çiqasî pîvanên mafê mirovan li Efrînê binpê kirin. Niha jî bi rêbazên qirkirin, kuştin, guherîna demografîk û dagîrkeriyê didomîne."

### 'Bi tena xwe 58 rojan destana qehremaniya nivîsand'

Evîn Yûsiv da zanîn ku di rastiya êrişan de dewama komploya navneteweyî ya li dijî Rêber APO û civaka birêxistinkirî bû û axaftina xwe wiha domand:" Gelê Efrînê beriya êrişan bi meş û mitîngên xwe bi dehan caran hişyarî da wijdanê mirovahiyê. Lê mixabin rêdana êrişan, têkçûna vê wijdana mirî diteyisîne. Efrînê bi îradeya xwe ya xweser, bi tena xwe 58 rojan destana qehremaniya nivîsand. Ji dunyaya ker û lal re isbat kir ku teknîk nikare îradeya gelan têk bibe. Faşîzma Tirk di bingeh de tecrubeya demokratîk li Sûriyeyê hedef digirt. Bi êrişên li ser jin û ciwanan, faşîzmê dixwest hevgirtina gelan li bakur û rojhilatê Sûriyê têk bibe. Berovajî, tevahî pêkhateyên Efrînê li dora hêza xwe bûn mertalek zindî û tevlî nava Berxwedana Serdemê bûn."

### 'Koka me hişk nabe'

Herwiha Evîn Yûsiv diyar kir ku Tirkiye sîstemeke li dijî gelan e û got, dewleta dagirker dixwaze em li ser axa xwe mêvan bin û li gorî xwe jî demografiya herêmê biguherîne. Lê pêwîst e faşîzma Tirkan baş zanibe ku çiqas demografiyê biguherîne jî, kokên me ziwa nabin. Em xwedî ax, dîrok û resentiyê ne.






### 'Bi Sembola Aştiya Cihanî Tê Qirkirin'

Endama kordînasiyona giştî ya Kongreya Star Evîn Yûsiv di dawiya axaftina xwe de bang li saziyên navneteweyî, aşîtîxwaz û rêxistinên mafê mirovan kir ku Warê Zeytûnan (sembola aşîtiya cihanî) ji kiryarên dagîrkeriya Tirkan û çeteyên wê biparêzin û ev tişt got: "Îro li ber çavên hemû cîhanê sembola aşîtiyê tê qirkirin. Gelê ku di avakirina Sûriyê de xwedî rola bingehîn e, li ber rûyê wa tê qetilkirin. Pêwîst e hemû saziyên têkildar, dewletên xwedî bandor û rêxistinên mafê mirovan destwerdana dagîrkeriyê bikin û rê li ber herikîna xwîna gelê me bigirin. Ev jî erkekî mirovî û exlaqî ye."

# 58 rojên Berxwedan serdemê bi kamîreya rojnamevaneke şahid

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Tevî ku kamîre wê nikaribe rastiya berxwedana 58 rojan, vîn û qêrîna Dayîkên Efrînê nîşan bide, lê di mejiyê rojnamevan Raperîn de dîmenên ku negihiştî bigre hatîne sawirandin û dibêje, ew dîmen ticar nayên bîrkirin û windakirin.**

Nûçegihana Ronahi TV ya bi navê Raperîn Elî (25) ku ji Efrînê ye, şahidiya êrişên hov yên li ser Efrînê kiriye. Raperîn heta 16`ê Adarê li Efrînê bi erkê xwe yê rojnamevaniyê rabû û bû berxwedana gelê xwe, hovitiya êrişên Dewleta tirkî ya dagîrker ragihandin cîhanê.

Rojnamevan Raperîn di salvegera dagîrkirina Efrînê ji rojnameya me re axivî.

### 'Efrîna sembola şoreşa Rojava bû'

Raperîn diyar kir ku weke rojnameger ev 4 sal in ew birîna Efrînê û trajediya gelê xwe dişopînin û got, Efrîn tevayiya gelên Sûriyê li ser erda xwe hembêz kir. Ji destpêka şoreşê ve, ji her alî ve xwe bi rêxistin kir û xwe bi rêve bir. Jixwe li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dibistana yekê ya bi zimanê kurdî li Efrînê hat vekirin; zanîngeha yekê li Efrînê bû û di her warî de xwe pêş xist. Tevî ji her alî ve, dorpêçkirî bû, lê bûbû sembola şorşea Rojava."



### 'Berxwedan, vîna dayîkan bi kamîra jî nayê vegotin'

Raperîn herwiha roja destpêkê ya êrişan anî bîra xwe û wiha axaftina xwe domand: "Dagirker bi qasî bedewiya Efrîn û mirovbûna Efrîniyan, bi kîn û êrîşên hovane û şêwazên dermirovî êrişî Efrînê kir. Lê gel bi hezkirina xwe ya ji bo Efrînê li hemberî çeteyên herî bihove û dewleta duduyan ya bihêz ya NATO`yê ber xwe da. Dijminê mirovayiyê jî li hemberî berxwedana serdemê 72 balafir û çekên xwe yên giran û kîmyawî xistin dewrê û dibinstan, statoynên avê, nanpêjxane, nexweşxane kirin amanc. Lê wijdana cîhanê li hemberî vê qirkirinê nelivîya. Lêbelê disa jî zarokên Efrînê bi berxwedaneke bêhempa ya serdemê ku li seranserê cîhanê dengek mezin veda, berteka xwe nîşan da. Jixwe dayikên Efrînê amade bûn canê xwe feda bikin.



Raperîn helwesta dayîkên Efrînê wiha ragihand: "Di hevdîtinên me yên wê demê pêk anî de, tişta ku herî zêde bala min kişand vîn û israra dayikan ya di berxwedanê de bû. Ya ku vîna şervanan xurtir dikir jî helwesta dayîkan bû. Rast e, zarokên xwe ji dest didan, lê her tim digotin, 'em xaka xwe bernadin, jiyana bê Efrînê ji bo me mirinek e'. Qêrîna dayikên me digihêja ezmanan, me ew belge kirin, lê bawer nakim kamîra û dîmen bikaribin naveroka van kêliyan vebêje".

### `Kamîre ket, lê di mejiyê min de ev dîmen û kêlî hemû hene'

Raperîn herwiha got, tişta dawî ku min li Efrîn dîtî, mirin û wêranî bû. Kamîraya min ji destê min ket û min nikarîbû ew wêneyê dagirkeriyê wek heyî bikişînim. Lêbelê dibe ku min bi kamîrayê nekişandin, di mejiyê min de ev dîmen û kêlî hemû hene.

### Dûrûtiya cîhanê

Di salvegera 4'an ya dagîrkirina dewleta tirk ya Efrînê, tora çalakavanên Efrînê amarên sûcên 4 salan yê ji aliyê wê ve hatin belgekirin belav kir. Li gor agahiyên saziyên fermî hejmara di nava 4 salan de herî kêm 157 sivîl, di navê de 75 kesên bitemen, 18 jin û 10 zarok, bi destê dewleta tirk ya dagîrker û çeteyên wê de hatine kuştin. Herwisa herî kêm 3 hezar û 705 sivîl; di navê de 300 kesên bitemen, 200 jin û 50 zarok hatine revandin. Derbarê guhertina demografîk jî, zêdetirî 32 wargehên ne neşteciyê, 36 kamp û 16 mizgeftan hatîne çêkirin, ji bilî guhertina hejmareke mezin ji navên gund û kolanan. Di heman demê de wêrankirin û talankirina zêdetirî 65 şûnwarên arkeolojîk hilweşandîne û talan kirine; 400 hezar darên zeytûnan birîne û şewitandîn e.

Rojnamevan Ronahî TV Raperîn bal kişand ser peyman û helwestên dewletên Hegemon û ev şirove kir: "Efrîn ji xwe re kirin navenda bazariyên qirêj, Dagirkerê Tirk ji destpêka aloziya Sûriyê ve hewl dide Efrînê dagir bike û bi Rûsya re lihevkirinek tarî pêk anîn. Efrîn li ber çav û bêdengiya cîhanê dagir kir. Heta niha piştî koçberkirina xelkê Efrînê û hemû komkujiyên ku li ser vî gelî hatine kirin, civaka navneteweyî li gorî berjewendiyên xwe tevdigere. Herwisa li ser êşa xelkê Efrînê, bêdeng e. Lê li ser şerê Rûsya û Ukranya dibe xwedî helwest, ev jî dûrûtiya cîhanê nîşan dide. "

Raperîn Elî teqez kir ku ewê bi kamîre û nivîsa xwe berxwedan, hawara gelê xwe bişopîne. Herwiha da zanîn ku wê her tim şopedara heqîqetê be û axaftina xwe wiha qedan" :Hêvî ji dagîrkeriyê mezintir e, hêviya me berxwedana gel û hêzên me ye. Wê bi vê berxwedanê Efrîn ji dagirkeran bê rizgarkirin û zû an dereng teqez emê vegerin welatê xwe."



# Amadekariya Navenda Çandê ya Newrozê

## Heyva Adarê ji bo gelê Kurd heyveke taybet e. Lewra di vê heyvê de hem bûyerên bi êş hem yên serkeftinê qewimîne. Di vê heyvê de herwiha rojên girîng û xwedîwate hene. Yek ji wan roja Cejna Newrozê ye. Her sal gelê Kurd bi cilûberg û çand û hunera xwe vê rojê pêşwazî û pîroz dikin.

**Dilîn Ehmed-Qamişlo**

Rêveberê Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo Ehmed Hemo, li ser amadekariya çalakiyên xwe ji rojnameya me re axivî. Ehmed Hemo diyar kir ku, îsal ji-



mara komên govend, stiran û şano wê ji salên borî pirtir bin. Lewra sal bi sal coşa gel ya vê rojê xurttir dibe. Ehmed axaftina xwe wiha domand: "Ji bo amadekariya me ya Newrozê vê dibêjim. Li navenda me şeş kom hene yek ji wan govend e. Herwiha sê hunermendên serbixwe jî hene. Di nava van koma de koma Sakîne ya xweser heye. Wan jî heta niha pênc stiran hazir kirine. Îsal wê jimara komên me zêdetir be, lewra par ji ber jimara



kêm ya koman Newroza me zû bi dawê bû. Par 7 kom bûn îsal wê 13 kom bin."

Ehmed Hemo li ser Newroza zarokan jî wiha got: "Par me Newroza zaroka li dibistanan pîroz kir. Lê ne wekî me xwestî hat lidarketin. Ji berw ê îsal emê li navenda Çand û Hunerê ya Mihemd Şêxo li dar bixin. Heta niha me roja lidarxistina 'roja Newroza zarokan', diyar nekiriye."

Ehmed Hemo di dawiya axaftina xwe de ji gelan bi taybetî gelê Kurd xwest ku, li rojên xwe yên pîroz û çand û hunera xwe xwedî derkevin, lewra çand nasnameya civakê ye.

### 'Bi ruhê şervanên azad Newrozê pêroz bikin'

Mamosteyê govendê û amûrjen Rewan Temo jî, derbarê mijarê de bal kişand ser girîngiya cejina Newrozê û got, divê Newroza 2022'yan bibe bersiva êrişan û gel bi berxwedana xwe Rêber Apo ji zindanê azad bike.

Rewan axaftina xwe wiha domand: "Xwedîderketina li xwîna şehîdan û berxwedana li hermberî dijmin, di rojên wiha pîroz de diyar dibin. Dijmin li ber têkoşîna gelê me, nema dizane bi çi rêbazî me qir bike. Ji bo wê hêviya me ew e ku, gelê me bi hemû pêkhateyên xwe bi rihê azadiyê vê rojê pîroz bikin."



Rewam Temo di dawiya axaftina xwe de got, divê Newroza 2022'yan bibe egera azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan.

### `Şervan bi çekên xwe hunermend bi deng û awazên xwe têdikoşin`

Li ser heman mijarê dengbêj û amûrjen Sîmav Ehmed jî da diyarkirin ku, tevî rewşa heyî û êrişên ser gel, ew bi coşeke xurt ji bo Newrozê amadekariyên xwe dikin. Sîmav axaftina xwe wiha domand: "Ji bo derxistina gel ji rewşa şer û pîrozkirina vê rojê, em bi moraleke pir xurt amadekariyên xwe dikin. Ev sê heyv in me dest bi provayên xwe yên mûzîkê kiriye. Em bi hêvî ne bi dilê gelê me be."



Sîmav Ehmed di dawiya axaftina xwe de got, ji bo parastina çand û hunera civakê, şervan bi çekên xwe, hunermend bi deng û awazên xwe divê tekojîn bikin.

Herwiha Sîmav Ehmed hêvî ji gel kir ku bi coşeke pir xurt û bi dilxweşî pêşwaziya cejna Newrozê bike û got, pîrozkirina rojên wiha û bi moralên xurt, dibe bersiva dagîrkeran.

# Fîlmên Kurdî li benda sînemahezan e

**Kolektîfa Sînema ya Mezopotamyayê Festîvala 2. ya Fîlmên Kurdî ya Stenbolê wê di navbera 24-29'ê Adarê de pêk bîne.**

Festîvala Fîlmên Kurd a Stenbolê ya yekê sala 2019'an pêk hat. Festîvala duyemîn jî ji ber şewba Covîd-19 bi du sal û nîvan hate taloqkirin. Festîvala 2. ya Fîlmên Kurdî a Stenbolê wê di navbera 24-29'ê Adarê de bê lidarxistin.



Di festîvalê de ku ji aliyê Kolektîfa Sînema ya Mezopotamyayê ve tê lidarxistin, wê ji çar parçeyên Kurdistanê 6 rojan 27 fîlmên dirêj, kurt û dokûmanter bêne nîşandan. Festîval wê bi nîşandana fîlmê Kurdên Êzidî dest pê bike. Di destpêka festîvalê de her wiha wê konserek jî hebe.

Ji Kolektîfa Sînema ya Mezopotamyayê Xezal (Ceylan) Gultekîn li ser festîvalê ji ANF'ê re axivî.

Xezal Gultekîn anî ziman ku ji bo festîvala duyemîn a mijareke bi taybet diyar nekirine û got, "Lê belê dema ku me karê xwe yê dîtbarî meşand, me hewl da ku li dora mijareke ku êdî sînemahezan li salonan bicivînin, kar bikin. Festîvala me wê 6 rojan dewam bike. Ji kategoriyên fîlmên metraj dirêj, metraj kurt û dokûmanteran wê 27 fîlm werin nîşandan. Ev fîlm wê ji çar parçeyên Kurdistanê bin. Bi giranî jî wê di dema nîşandana fîlman de derhênerên wan amade bin. Fîlmê 'Kurdên Êzidî' ku ji aliyê Amasî Martirosyan ve sala 1933'an hate kişandin û heta niha ne li Tirkiyeyê ne jî li Kurdistanê nehatiye nîşandan wê bibe fîlmê destpêkê ku di festîvalê de bê nîşandan."

Li ser rewşa heyî ya sînemaya Kurd Xezal Gultekîn wiha axivî, "Zehmet e ku mirov sînemaya Kurd di rewşa heyî de li cihekî diyarkirî destnîşan bike. Lê belê tevî astengiyan hemûyan jî mirov dikare bêje ku li dora feraseteke sînema ya berxwedêr bi pêş ve diçe."

***ANF***

# Li Dêrikê pêşangeha berhemên xwendekaran

**Navenda Perwerdeyê ya Dêrikê bi tevlêbûna gelek dibistanên navçeya Dêrikê pêşangeheke berhemên hunerî yên xwendekaran vekir.**

Bi armanca pêşxistina behreyên xwendekaran, Navenda Perwerdeyê bi tevlêbûna gelek dibistanên navçeya Dêrikê pêşangeha berhemên hunerî yên xwendekaran li hola Dibistana Seretayî ya Îbrahîm Mesûd li dar xist. Gelek mamosteyên dibistanên Dêrikê û malbatên xwendekaran tev lê bûn. Di pêşangehê de 125 tablo, peykerên û destkarî hatin pêşandan. Tê payîn ku pêşangeh 7 rojan berdewam bike.

Her wiha Navenda Perwerdeyê, rêveberiya Dibistana Îbrahîm Mesûd xelat kir.

***ANHA***



# Ji bo Helebce 2 hezar wêne

**Li Helebce bi pêmana salvegera kîmyabarana li Helebc ya 34'an, pêşangeheke wêneyên pêkhateyên bajêr hat vekirin.**

Li Helebce bi pêmana salvegere kîmyabarandina li Helebceyê ya 34'an, pêşangeheke wêneyên pêkhateyên bajêr hate vekirin. Di pêşangehê de 2 hezar wêne hatin nîşandan. Di ser kîmyabarana Helebce re 34 sal derbas bûn. Bi vê boneyê li bajarê Helebceyê yekem navenda Pêşangeha Helebce bi navê Pêşangeha Celal Azebanî ku yek ji şehîdên kîmyabarana Helebce ye, hate vekirin. Di pêşangehê de 2 hezar wêneyên kesayetên navdar ên pêkhateyên li herêmê hatin nîşandan. Gelek hemwelatî diçin pêşangeha Helebce da ku wêneyên kes û karên xwe bibînin.



Çalakvana jin a ji Helebceyê, Hemîde Cemal derbarê pêşangehê de got, "Vekirina pêşangeheke bi vî rengî dîrokê nîşanî her kesî dide ka berê çi qewimiye. Niha her kes bi saya van wêneyan dibe şahidê wê demê. Ez ê her piştgiriyê bidim Helebce da ku ev xebat bidomin."

Yek ji jinên ciwan ên Helebceyî, Gulan Elî jî got, "Pêşangehên wisa giringî û nirxê Helebceyê diyar dikin. Ji ber ku gelê Helebceyê gelek kefxweş dibe bi nîşandana dîrok û asta rewşenbirî ya Helebceyê di rabihuriyê de. Divê em piştgirê wan kesên bin yên ku dixwazin êşa Helebceyê nîşan bidin. Ji bo dîroka Helebceyê hîn bêhtir were naskirin."

Xwediyê galeriya Helebce, Aram Şamêranî jî derbarê pêşangehê de got, "Fikra vekirina vê pêşangehê ev çend sal in heye. Ji ber wê, me biryar da ku bi budceya taybet a galeriya Helebce vê pêşangehê vekin. Di pêşangehê de 2 hezar wêne hene."

***JINHA/HELEBCE***

# Li Soran festîvala çand û hunera Kurdî



**Li navçeya Soran ya Herêma Kurdistanê ji bo xwendekaran festîvala çand û hunera Kurdî hat lidarxistin.**

Li navçeya Soran a Herêma Kurdistanê ji bo xwendekaran festîvala çand û hunerê Kurdî hate lidarxistin.

Li Dibistana Dolaqajî ya navçeya Soran, festîvala çand û hunerê Kurdî hate lidarxistin. Armanca lidarxistina festîvalê ew bû ku nifşê nû ji çanda Kurdewarî agahdar bikin.

Di festîvalê de berhemên kevin ên Kurdewarî hatin nîşandan. Herwiha xwendekaran stranên foklorî gotin. Dengbêjên navçeyê jî berhemên xwe pêşkêş kirin.

Rêvebera Dibistana Dolaqajî, Sirud Hemîd got, "Armanca vê festîvalê, zindîkirina çanda kevin a bav û bapîrên me ye, ji bo ku nifşê nû jî pê zanibe."

Xwendekar Perêzan Zuhirî jî got, "Ji ber tevlî vê festîvalê bûm kêfxweş im. Ji ber ku berê agahiya min li ser van berhemên Kurdî nebû. Divê girîngeyeke zêde bidin çand û hunerê Kurdî û biparêzîn."

***ROJNEWS/SORAN***

# `Wê Newroza 2022`yan bibe aştî û azadiya gelan`

**Welatiyên bajarê Qamişlo dan zanîn ku Newroz tê wateya berxwedan, hebûn û azadiyê. Herwiha gotin, çawa ku Kawayê Hesinkar şeva Newrozê agir geş kir û roja nû hilat, emê jî bi wî ruhî têkoşîn bikin û li hemberî dijmin bi ser bikevin.**

**Darîn Silê-Qamişlo**

Derbarê cejna Newrozê de welatiyên bajarê Qamişlo hestên xwe anîn ziman û gotin, her sal bi dilekî germ em Newroza xwe pîroz dikin û têkoşîna xwe di Newrozê de didin diyarkirin. Îsal jî tevî êriş û dagîrkeriya ku li herêmên me tê kirin, emê agirê Newrozê geş bikin û ji êrişan re bibin bersiv.



Welatiya bi navê Perwîn Hisên Hacî cejna Newrozê di serî de li rêber Abdullah Ocalan, li tevayiya gelê xwe pîroz kir û wiha got: "Wek em dizanin 21`ê Adarê dîrokeke wê ya pir girîng û biwate heye. Dema Kawayê Hesinkar li çiyayê Kurdistanê agirê Newrozê pê xist, ew despêka serhildanê bû û li hemberî dijmin berxwedana herî mezin bû. Ji wê demê ve gelê Kurd li ser piyan e, heta gihîşt fîkir û felsefeya Rêber Apo. Ev felsefe ji bo berxwedanê wateyeke nû da jiyanê û hişt ku vîna Kurdan xurt bibe. Heman demê leheng derketin, yek ji wan jî Mazlum Dogan bû ku pêşengiya berxwedanê kir. Wê demê agirê Newrozê bi canê xwe nûjen kir û ji cîhanê re eşkere kir ku gelê Kurd xwediyê berxwedaneke mezin û dîrokiye."

**`Cejna Newrozê bi tevayiya pêkhateyan tê xemilandin`**

Perwîn diyar kir ku tevayiya pêkhateyên li bakur û rojhilatê Sûriyê, roja Newrozê pîroz dikin û axftina xwe wiha domand: "Cejna Newrozê bi tevayiya pêkhateyan tê xemilandin. Li gel her pêkhateyê ev roj tê pîrozkirn. Ti ferq û cudayî di navbera pêkhateyan de nîne. Newroz ne ji bo gelê Kurd tenê, ji bo her kesî roja vejînê ye. Em tev bi cilên kurdî pîrozbayiya Newrozê dikin. Her sal berî du mehan em haziriyên cilûbergên Newrozê dikin. Herwiha em di meha Adarê de her roj agirê xwe pê dixin û Newroza xwe bi dilekî geş pîroz dikin."

Perwîn Hesen Hacî di dawiya axaftinên xwe de got, em bi hêvî ne ku her sal Newroz bi xweşî derbas bibe û di sala nû ya 2022`yan de êrişên ser gelê me werin sekinandin.



**`Divê di sala nû de têkoşîn û biratiya gelan xurttir bibe`**

Ciwanê bi navê Umer Elî Hisêno yê ji pêkhateyê Ereb Newroza 2022'yan li gelên bakur û rojhilatê Sûriyê pîroz kir û wiha got: "Bi salan e em cejna Newrozê pîroz dikin. Di roja Newrozê de gel li hev kom dibe û Newrozê pîroz dike. Ev roj ji bo me tevan giringiya wê heye, çimkî roja netewbûnê ye. Wek pêkhateyên Ereb jî, em li kêleka pêkhateya Kurd, Suryan û pêkhateyên din yên li herêmê, vê rojê bi heyecaneke mezin pîroz dikin. Çimkî em ji hev ne cuda ne. Sekna me bi hev re wateya vê rojê diyar dike."

Umer Hisêno bal kişand ser Newroza 2022`yan û axaftina xwe wiha qedand: "Em dikevin saleke nû ya berxwedanê. Divê di sala nû de em têkoşîn û biratiya gelan xurttir bikin. Herwiha em bawer in ku ev sal bibe sala aştî û azadiyê."

Welatiyê bi navê Ziyad Umer jî teqez kir ku her Newroz ji bo gelên Kurdistanê dibe destpêkeke nû û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em di şexsê Mazlûm Dogan'ê Kawayê Hesinkar yê hemdem, Zekiye, Ronahî û Bêrîvan de, cejna Newrozê ya vejîna Kurdan pîroz dikin. Çimkî van kesan vejîna nû da xuyakirin û riya azadiyê diyar kirin. Li gel Kurdan Newroz tê wateya berxwedan, hebûn û azadiyê."



**`Berî şoreşê jî tevî zor û zehmetiyan Newroz dihat pîrozkirin`**

Ziyad Umer bîr xist ku berî şoreşa Rojava li bakur û rojhilatê Sûriyê cejna Newrozê bi zor û zehmetî dihat pîrozkirin û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Berî 2011`an dema me roja Newrozê pîroz dikir, me gelek zehmetî ji aliyê rejima Sûrî ve dikşand. Dema me agir pê dixist leşkerên rejimê dihatin agirê me vedimirandin. Gelek caran rejimê riyên sereke digirtin da ku ti kes neçe qada Newrozê û pîrozbayî neyên kirin. Tevî ku rejim li dijî me bû, me şahiya xwe dewam dikir û Newroza xwe pîroz dikir. Her cara ku agirê me vedimirandin me agirek mezintir bê dixist. Ev roj roja me ye. Çiqas zehmetî û kuştin jî hebe emê li ber xwe bidin û roja xwe pîroz bikin."

**`Piştî şoreşê li Rojava Newroz bi aramî tê pîrozkirin`**

Ziyad Umer axaftina xwe wiha qedand: "Piştî şoreşa Rojava, em ketin asteke nû. Em niha bi rehetî û ewleyî Newroza xwe pîroz dikin. Parastina me çêbûye, her sal di dema Newrozê de hêza parastinê û endamên tenduritiyê û yên Heyva Sor ji bo ewleyiya gel di nava tevgerê de ne."

# Bihabûna nanê siyahî barê welatiyan giran dike

**Navenda nûçeyan-Qamişlo**

**Gelê bajarê Qamişlo, herwiha bajar û herêmên din yên bakur û rojhilatê Sûriyê ji ber bihabûna nanê siyahî, nêzî heftiyekê ye rastî kirîza bihabûna nan tên. Ard biha bûye û kîsê nan ji hezar û 200 lîreyan gihîştiye hezar û 500'î.**

Nanê siyahî li kêleka nanê temwînê dibe alîkar. Gelek jê ji ber ku nanê temwînê ne zêde baş e, nanê siyahî bi kar tînin. Ev nan ji ardê spî yê zîro tê çêkirin. Lê nanê temwînê bi tevlîkirina ardê reş û yê gariş çêdibe. Ji ber wê jî pirani nanê siyahî ji yê temwînî pirtir bi kar tînin. Li bajarê Qamişlo ev nan rojê ji aliyê çend firûnan ve tê derxistin, lê van rojan bihabûna ardê spî bûye sedema bihabûna kîsê nan.

Li ser mijarê welatiyên bajarê Qamişlo, xwediyê firûna Sîtî ya nanê siyahî û Hevserokê beşê Pêşjiyanî ya kantona Qamişlo nêrînên xwe ji me re anîn ziman.

**`Her tişt biha bibe jî pêwîst e nan biha nebe`**

Welatiya bi navê Fatma Hecac ya ji bajarê Qamişlo diyar kir ku nanê Siyahî bihayê wî li ser wan pir giran e û axaftina xwe wiha



domand: "Ji ber ku adeya nanê temwînî ne zêde baş e û rojane nayê peydekirin em neçar dibin ku nanê siyahî bi kar bînin, da ku em pêdiviya rojane peyda bikin. Niha jî ev nan pir biha bûye, em neçar in bi vê bihabûnê jî bi kar bînin. Em rojê bi şeş hezaran nan dikirin. Çimkî kîsek nan têra malbatekê nake. hin malbat hene jimara wan gelek e, ancex bi sê yan çar kîsan roja xwe biqedînin. Ji bilî nan gelek pêdiviyên din ji malê re pêwîst dibin. Eger her tişt biha dibe, pêwîst e nan biha nebe. Çimkî di malê de nan madeya sereke ye."

Fatima di dawiyê de got eger bihayê nan wisa bimîne êdî welatî wê nikaribin nanê xwe peyda bikin, herwiha bang li rayedarên pêwendîdar yên Rêveberiya Xweser kir ku çareseriyê peyda bikin.

**`Şerê navbera Ukrayna û Rûsya bû sedema bihabûna nan jî`**



Xwediyê firûna Sîtî ya nanê siyahî Hozan Mehmûd sedema bihabûna nan ji me re eşkere kir û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Sedema bihabûna nanê siyahî ard e. Ji ber şerê navbera Ukrayna û Rûsya ardê spî (zîro) biha bûye. Berê me yek ton ardê spî bi 420 dolarî dikirî, lê niha em bi 560 dolarî peyda dikin. Bihabûna ard nebûye sedema bihabûna nan tenê, bûye sedema kêmbûna wî jî. Ji ber wê jî berhemê nan li herêmên me kêm bûye."

Hozan got, ji ber bihabûna ard me bihayê kîsê nan jî bilind kir û wiha pê da çû: "Piştî bihabûna ard û têkîliyên me bi rêveberiya pêşjiyanî re bihayê kîsê nan ji hezar û 200'î bû hezar û 500 lîre."

Hevserokê beşê pêşjiyanî ya kantona Qamişlo Remedan Hisên jî derbarê kirîza



nan û bihabûnê de wiha axivî: "Piştî şerê



navbera Ukrayna û Rûsya di herêmên me de jî kirîza nan derket. Çimkî ardê nanê siyahî piranî ji Ukrayna dihat. Vî şerî bandoreke aborî li me tevan kiriye. Wek rêveberiya pêşjiyanê me bi yekîtiya firûnên nanê siyahî re civînek li dar xist di encamê de biryareke demî ji bo nan hat dayîn. Em neçar bûn ku nan biha bikin da ku firûn neyên sekinandin û em nekevin kirîzeke din. Nanê siyahî alîkariya nanê alî dike. kesê ku nanê alî bi destê wî nakeve yê siyahî bi kar tîne."

**`Hewldana avakirina kargeheke nû ji bo kontrolkirina ard`**

Remedan Hisên di dawiya axaftina xwe de got, Rêveberiya Xweser hewl dide ku di vê salê de kargehên taybet ji bo kontrolkirina ard ava bike, da ku gel bi rehetî nanê xwe peyda bike û kirîza nan çareser bibe.

# Di kimyabarana Helebce de çîroka Dayîka Emîre û zaroka wê ya 21 rojî

**Emîre Feteh ya 16'ê Adarê ji bo wê bûye birîna qeşûfînegirtî, behsa çîroka xwe û zaroka xwe ya 21 rojî di roja kimyabaranê de kir.**

34 sal li ser kimyabaran Helebce re derbas bûn. Di nava van 34 salan de tirajediya kimyabaranê ji ber çavê Helebceyiyan naçe û her sal bi vê rojê re careke din xwe nû dike. Yek ji wan jî çîroka têkoşîna jiyanê ya Emîre û zaroka wê ya 21 rojî di nava gazên kimyayî de bû.

Emîre Fetah Kikwas dayîka çar zerokên keçe, keça wê ya biçûk hîna 21 rojî bû, sibeha 16'ê Adarê dema êrîşa kimyayî li ser Helepçe hatî kirin weke roja îro behs kir û got: "Dema ku rejîmê êrîş kir hemû xelkê berê xwe dan jêrzemînan, hinek dayîkan ji bo pêdawistiyên zarokên xwe ji jêrzemînan derketin û xwarin amade dikirin. Balefir gelek zêde li ser esmanên Helepçe di firiyan, dema ku kesek ji jêrzemînan derdiket êrîş dikir."

**"Terektora li pêşiya me jî tejî cenaze bûn"**

Emîre Fetah da diyarkirin ku dema helepçe kimyabaran kirin ji bo ku kes sax jê nemîne balefir li esr esmanê wê digeriya û her der di nava dumana gazê de windabû û wiha dom kir: "Me wê demê nedizanî em kude biçin. Xelkan ji min re gotin ku divê em jî ber bi gundê Hewar ê sînorê Îranê ve biçin. Em jî ber bi gundê Serken ve rêketin, terektorek cenaze têde hebû, dema ku min pirskir hunê kude biçin, got van cenazeyên ku ji ber çekên kimyayî emê bixin gorek komî de."

**"Zaroka min ya 21 rojî li ber milê min bû"**

Emîre Feteh bibîrxist ku ew bi zaroka xwe ya 21 rojî ve ket nava hewarê û ber bi sînorê Îranê ve diçun û wiha berdewam kir: "Di rê de zaroka min ya 21 rojî li ber milê min bû, pasdarên Îranê rê girtin û gotin ev zaroke çiyê teye? Min got zaroka mi di vereşe, nehlan derzî lê bidim, di gotin ma çiye ger bi mire jî weke van hemû kesên mirin, pişte me rêya xwe dewam kir em çun Daretu û Şêxan û piştre jî bi zehmetî heta em gihan Orduga ya Sînor em bi cih bûn. Min di rêde jinek dît wê zaroka wê çêbûya, min alîkarî dayê, kesê alîkarî nedida, min navga zarokê birî û hinek cilên zaroka xwe ya 21 rojî dayê."

**"Kimyabaranê tenê laşê me birîndar nedikir, aqlê mirovan jî têk dibir"**

Emîre Feteh wiha behsa gazên di kimyabaranê hatî bikaranîn kir: "Ew gaza ku bi me ketî laşê me birîndar ne dikir, me gelek kes didîtin xwe û zarokên xwe di avêtin, yan jî her digriyan, ji ber



gazê bandor li ser mejiyê mirovan dikir. Helepçe ber bi hilweşanê ve diçû heta sala 1991'an piştre em vegeran, di dema serhildanê de em koçber bûn, ji ber wê divê hertim xizmet ji Helepçe re were kirin."

*JINHA*



# Desteya Hundir têkildarî pîrozbayiya Newrozê biryarnameyek derxist

**Desteya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê têkildarî pîrozbayiya Newrozê biryarnameyek weşand û di biryarnamê de hat zanîn ku gelek tedbîrên ewlekariyê ji bo Newrozê hatine girtin.**

**Navenda Nûçeyan**

Desteya Hundir ya bakur û rojhilatê Sûriyê têkildarî pîrozbahiyên Newrozê biryarnameyek ragihand. Di biryarnameyê de wiha hate gotin:

"Em cejna Newrozê li hemû gelên xwe û gelên cîhanê pîroz dikin û hêvî dikin ku ev cejn bi aramî û aştî derbas bibe.

Li ser vê yekê em hêvî dikin ku her kes li gorî tedbîrên ewlekariyê tev bigerin ku ev jî ev in:

- Ji roja yekşemê (20.03.2022) saet 06:00`an heta roja sêşemê (22.03.2022`) saet 06:00`an kamyon û sehrîc dernakevin trafîkê.
- Ji roja înê (18.03.2022) saet 06.00'an heta roja sêşemê (22.03.2022) saet 06:00 motorsîklêt bi hemû cureyên xwe ve heta leşkerî, tev nagerin.
- Têkildarî dergehên hundirîn ji roja duşemê (21.03.2022) saet 06:00'an heta roja sêşemê (22.03.2022) saet 06:00'an, derbaskirina kel û pelan bi hemû cureyên xwe ve û ferdan qedexe ye.
- Derveyî qanun û sîstemên heyî qedexe ye ku welatî, leşkerî û hêzên ewlekariyê gule û fetaşeyan bi kar bînin. Dema ev yek pêk hat dê li gorî qanûnê werin cezakirin û heta ku çek ruxsetkirî bin jî dê werin desteserkirin."

# Agirê Newrozê li Metîna hat dadan

**Gerîlayên HPG û YJA Starê yên li herêma Metîna Newroza 2022'yan bi coş û kelecaneke mezin pîroz kirin. Gerîlayan got, bi hatina Newrozê re em xwe ji bo pêngavên nû amade dikin.**



Gerîlayên HPG û YJA Starê li herêma Metînayê ya Herêmên Parastinê yên Medyayê, Newroza 2022'an bi coşeke mezin pîroz kirin. Gerîlayan serê sibehê dest bi pîrozbahiyê kirin, agirê Newrozê dadan, li dora êgir govend gerandin û dirûşm qîriyan.

Di pîrozbahiyê de ku di binê baranê de hate kirin, her wiha axaftin ji gerîla re hate kirin. Di axaftinan de hate gotin, "Berxwedana ku Kawayê Hesinkar li dijî zaliman nîşan da, îro di nava rastiya PKK'ê de roj bi roj bêhtir eşkere dibe. Berxwedana hevrê Mazlûm Dogan a li dijî dagirkeran îro jî dewam dike. Li dijî zilma dijmin a li ser gelê Kurd, gerîla bi her awayî li ber xwe didin. Bi Newrozê re hatina biharê ji bo gerîla ji bo pêngav û serketinên nû gelekî girîng e. Bi wesîleya Newrozê divê em xwe ji pêngavên nû re amade bikin. Em Newrozê di serî de li Rêber Apo û gelê Kurdistanê pîroz dikin."

Gerîla di dema pîrozbahiyê de ji ANF'ê re axivîn û diyar kirin ku wê Newroza 2022'an bi pêngava 'Dem dema azadiyê' bi ser bixînin. Gerîlayan destnîşan kirin ku di sala 2021'ê de berxwedan û lehengiyên gelekî mezin de ne û ragihandin ku Tevgera Azadiyê wê ti carî têk neçe, ji ber ku berxwedana şehîd Mazlûm Dogan ji xwe re dikin esas. Gerîlayên ku li çiyayên Kurdistanê Newroza 2022'an pîroz kirin, diyar kirin ku heta azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wê berxwedana xwe dewam bikin.

*ANF*



# Dîmenê çalakiya sabotajê ya li Şemzîna hat weşandin

**Gerîla TV dîmenê çalakiyeke sabotajê ya gerîlayên YJA Starê weşand, ku 15'ê Îlona 2021'ê li bejayiya Şemzîna hatibû lidarxistin û di encamê de 6 dagîrkerên dewleta Tirkan hatibûn cezakirin.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyê ev agahî dabû:

"Di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Bazên Zagrosê de;

15'ê Îlonê saet di 08:40'î de li navçeya Şemzînanê ya Colemêrgê, wesayiteke artêşa Tirk a dagirker a bi tîpa Reo ku ji qereqola Şkeftan derket û ber bi gundê Katûna ve diçû, bû hedefa çalakiya sabotajê ya hêzên me yên YJA Starê. Di çalakiyê de wesayit hate îmhakirin, 6 dagirkerên tê de hatin cezakirin, 2 dagirker jî birîndar bûn. Artêşa Tirk a dagirker piştî çalakiyê kuştî û birîndarên xwe bi ambûlans û helîkopteran ji qadê bir.

Ev çalakiya serketî ya ku ji aliyê hêzên me yên YJA Starê ve hate lidarxistin, ji bo tolhildana 6 hevrêyên me pêk hat, ku li Girê Sor di êrişa nemerdane ya dewleta Tirk a dagirker de bi çekên kîmyewî hatibûn şehîdxistin."

*ANF*



# Li Hewlêrê mêrekî keça xwe ya 15 salî kuşt

**Li navçeya Soran a Hewlêrê mêrekî keça xwe ya 15 salî bi hinceta ku tevî hevalên xwe derketiye derve, qetil kir.**

Berdevkê Polîsên Rêveberiya Têkoşîna li dijî Şîdeta li ser Jinan Şêrwan Xalid ragihand 18'ê mehê saet 03.00'an, cenazeyê zarokeke keçîn gihandine nexweşxaneya navçeya Soranê ya Hewlêrê ku şopa 6 guleyan li ser bendena wê hebûye.

Şêrwan Xalid ragihand zaroka hatiye qetilkirin, xwendekar bûye û 15 salî bûye.

Li gorî agahiyên berdest kujerê zarokê bavê wê ye û bi biryara dadgehê hatiye destgîrkirin.

Li gorî agahiyên ku Şêrwan Xalid dane, zaroka 15 salî ji ber hinceta ku bi hevalên xwe re derketiye derve, bavê wê ew qetil kiriye.

*ANH*



# Newroz tava rojê ye, PKK jî partiya Newrozê ye

**Newroz çi ye? Kulîlka derdikeve û tava rojê ye; Sekna jiyanê ye, vebûna rengaleya xwezayê ye û dayîna xwînê ye, ji tevayiya rayên jiyanê re. Va ye PKK jî wisa ye. Bi rastî jî PKK partiyeke Newrozê ye.**

PKK partiya xwînê ye ku dimeşe ber bi jiyanê ve. Eger di xwezaya vejînê de tiştek hebe hilkeftina wê, şînbûn û vebûna kulîlkbûnê ye. Lê yek jî di van rojên Newrozê de bagerên sexte hene. Carna kulîlkan jî dierçiqînin, tovên şîntayiyan ku li ber tamgirtinê ne dişewinin. Ev jî di nava me de hene. Ma em hindik dibin, zemînê erçiqandina tovên vejînê?
PKK ku partiya Newrozê ye çendî di cih de ye, çendî jiyanî ye û çendî ravekar e; dîrok û rojaneya wê jî erçiqandin, ewqas raste.



**Em bi van zagonan, wan kurmikên di hundirê dara azadiyê de perîşan dikin**

Me tenê bi vê bawerî anî: "Çi zagon nikarin raserê zagonên jiyana azad bibin xwedî hêzekê. Hêza herî mezin, zagona jiyana azad e." Di derketina me ya yekem de, me got: Zagona herî mezin viyana jiyana azad e. Bi hemû aliyan ve nebe jî, ya ku serketiye ev e. Ên ku dibêjin zagonên mirinê yên herî hêzdar in û van zagonan bi xwîn rijandinê her roj disepînin, bi qasî zagonên dijmin ên mirinê yên li ber çav, yek jî zagonên xayîn û nenasên azadiyê ne. Yek jî zagonên rizî, nebûne yên xwe, xwe pênase nekirine. Zagonên margîseyan (bûkalemûn).
Me li van salan ev zagon e çespand. Me dît ku ev zagon zagona herî hêzdar e. Bi taybetî em li hember Tirkiye ku digot, 'eve qet nikare bê gotin û yên ku bibêjin serê wan diçe' tenê bi qulkirina vê zagona weke zirx ve neman, em wê parçe parçe dikin, a xayînan jî. Êdî em bi van zagonan, wan kurmikên di hundirê dara azadiyê de perîşan dikin...

**Ji niha şûn ve her roj Newroz e**

Ji Kawa'yê Hesinkar heya Mezlûm'an gelek şervanên azadiyê yên esîl hene. Em ji Helaci Mensûran bigrin heya Pîr Sultanan, heya Nesîmiyê ku li Sîwasê hate şewitandin, hemû şervanên azadiyê yên vê axê ne. Lê bi rastî jî di kesayeta Tirkiyê de serdestên ku herî dawî, bi zagonên bê wijdan kar dikin. Ew di nava şerekî mezin de ne. Lê me di vî şerî de cihê xwe baş girt.
Careke dîtir bi mirovahiyê ve li vê derê jiyana azad û dîroka azad destpê kiriye. Ji vê dergûşiyê re şahidîkirin û dilsoz mayîn, ji bo me pir balkêş bû û îro van em anîne vir. Ez bextewer im, em di nava pîrozahiyeke rast de ne. Dema me destpê kir, me axaftineke wiha kiribû: 'Ji niha şûn ve hemû roj Newroz in. Di van 25 salan de bi rastî hemû sal rojên Newrozê ne. Soza me ev bû, me vala dernexist. Lê ya ku zaliman diçespandin êş, îşkence û perçiqandin jî hebûn. Gelek mirov bi her cure teknîk, çek û îşkenceyê şewitandin. Emê çawa li bîranîna yên ku hatine şewitandin xwedî derkevin? Hêza tolgirtina PKK'ê; Zekiye, Zîlan, Ronahî weke ku bûn pakrewanên mezin ên van rojan, di bingeh de, ji bo gihîştina pirsa jiyana azad çawa ye, em li kiryar û gotina wan dizanin...

Ev Newroz bi qasî ponijandina herî dijwar ku dikare li hember her cure şerî tebat bike û bi ser bixîne tûjbûn e. Dinêre fêm dike, dimeşe çêdike, li pey serketin tê. Di PKK'ê de afirandina şervanan xebateke pir xweşik e. Van hemûyan bi ew hinek peyvên ku hun tim dubare dikin na, ji gotinê jî wêdetir, ez dadikevim puxteya wan. Ne rizgarkirina rojekê, bi qasî ku destpêk û dawiya mirov dike yek, ji karê viyan û afirandina mirov re mijûl dibim. Felsefeya vê çawa ava bûye? Ê ku dixwaze dikare ji vê felsefa wê binivîse û derxîne. Ê ku dixwaze siyaseta wê, yê ku dixwaze zanistiya leşkertiyê, yê ku dixwaze hunera wê, yê ku dixwaze estetîka wê dikare derxîne, her tişt heye. Em hemûkan dikin yek.
Li ba min rastî dijîn, li ba min xweşikî dijîn, li ba min di şer de serketin, di jiyanê de evîn dijî.
Fermana herî mezin, rêpîvana çirûska hestê ye ku di mezinahiya ramana rast de ye. Bi qasî leza roniyê lezdar e û takekesê/a ku xwe bi tev de kiriye enerjî. Em hewl didin ku vê biafirînin. Ji bo vê ez dibêjim: Hinek ji we dixwazin ku bi me re bin. Ez dibînim ku bi me re ji partîbûnê û artêşbûnê re bixwestek in. Li vir polîtîka û leşkertî di leza roniyê de kar dike û sînorê herî dawî yê çêkirina nû ye. Taybetmendiyekê roniyê jî sotîner û ronîker e. Hûnê bibêjin ku "Ev şêwaz hetanî niha nehatiye sepandin." Lê şêwaza koletiyê ku em dijîn jî, li ti derî nehatiye sepandin. Ji vê koletiyê re tenê ev şêwaz dikare bibe bersiva bandordar. Wekî din çare tune. Min hemû pirtûkên mirovatiyê vekola û encama "derman ev e" derxist. Divê hûn fêmbar bin. Divê em di ronahiya wê ya sotîner de bijîn...

**Wek gelekî azad di nava vî welatî de, êdî hûnê hesabên jiyanê bikin**

Zîlan yek salî bû, çawa ponijî(fikirî)? Egîd, qet ne xwedî ezmûnên şer ên 15 salan bû. Du salî bû, çawa ponijî? Nivîsandinên ku kirine, tam rojaneya gêrîlayî ne. Kirinên wî jî di mercên herî zor de pratîka gêrîla ye. Tê wê wateyê ku zêde eleqeya vê bi ponijîn û perwerdeyê tine ye. Bi durûstiyê, biryardarî, jidilbûnê, karê ku dike bi hestên bilind û azwerî girêdanê re têkîliya xwe heye. Bi vê asta perwerdehiyê, bi van ezmûnan hûn dikarin hezar qetê Zîlan û Egîd rol bileyîzin.
Jixwe êdî ew bangawaziyek in. Hûnê ber bi bangawaziya wa ve baz bidin û divê bi misogerî dilsoziya bîranîna pakrewanên PKK'ê wisa bê fêmkirin. Şer, di heman demê de ji bo evîna mezin e... Cihê ku egîdî lê heye, têkîliyên pîroz, hezkirin û evîn pêk tên. Partîbûn, ji bo artêşbûna mezin e. Artêşbûn ji bo têkneçûnê, ji bo têkbirinê ye. Ev hemû ji bo axên ku hatine strandin, evîna jiyana şervanên azadiyê yên herî mezin, ku careke din bêne binavkirin û ji bo temsîla wan e.
Wek gelekî azad di nava vî welatî de, êdî hûnê hesabên jiyanê bikin. Hûnê bi misogerî nava malê bixemlînin. Hûnê xwedîti bikin li nirxên xwe. Ev der cihê vê pakrewanî, ev der cihê vê xweşikê, li vir li gor vê rêpîvanê tê jiyîn. Gava ku xayînek an jî dizek hat, mirov wisa li hember dertê. Ji giyanê heya ramana wê, ji zagonê heya siyaseta wê tev hatine diyarkirin.
***21 Adar 1998/Rêber Apo***

## Newroza 50'yî ya Tevgera Apoyî



**Faruk Sakik**

Li bakûré Kurdistanê piştî salên tefandina serhildanan, cejna Newrozê di nava gel de bi awayekî girseyî nedihat pîrozkirin. Ji ber qedexe û zilma dewletê, gelê Kurd li Bakur bi awayekî veşartî ev cejna xwe pîroz dikir.
1973yan, berî niha bi 49 salan. Rêber Apo çalakiya xwe ya yekê pêk anî. Li bendava Çubukê, li paytexta dewleta dagirker, Enqerê, tovê PKK'a ku wê piştî çend salên din bê damezirandin, çand. Li vir tez û nêrîna xwe ya "Kurdistan mêtingeh e, divê rizgar bibe" hîn vekirî û eşkere got.
Rêber Apo li vê derê roja Newrozê sembolîk be jî esas girtibû.
Her wiha di salên bêdengiyê de ji ber zextên rejimê jî, cejna Newrozê li gelek deveran hatibû jibîrkirin. Heta salên dawîn jî li gorî atmosfera polîtîk tenê komên siyasî vê cejnê pîroz dikirin.
Cejna Newrozê di salên jibîrbûyî de li zindanén Kurdistanê roja berxwedan û hildana ala hêviyê bû. Ji bo serhildanê roja Newrozê hatibû destnîşankirin..
Dîlên Kurd, di bin esareta hovane de jî, ev nîşana netewî bi bîr dianîn. Tade û zilma zindana Amedê di wijdanê mirovahiyê de wek lekeyeke reş a zilmê Dehaqên nûjen hatibû kolan.
Yek ji girtiyên Amedê û ji serwerên netewa Kurd, Mazlum Dogan di Newroza sala 1982'yan de agiyanê xwe diyarî bihûşta şehîdên netewa xwe kir.
Mazlum Dogan, endam û pêşewayê Partiya Karkerên Kurdistanê, ji bo rûreşkirina zilmê, ji bo banga berxwedanê, ji bo rûreşkirina xiyanet û mizgîna berxwedanê di şeva 21'ê adara 1982'yan de li qawişa 35'an de di hicreya xwe de çalakiya canbexşane li dar xist.
Piştî Mazlum Dogan di 1990'î de Newroz li kolanan hat pîrozkirin. Û êdî ev cejna jibîrbûyî, wek çîroka xwe, cardin bû nîşana vejîna netewa Kurd.
Êdî Newroz ne tenê cejneke netewî yan jî nirxekî dîrokî, her wiha ew roja dema serhildan û banga tékoşînê jî bû.
Newroz êdî li hemû bajarên Kurdistanê, li hemû kolanên bajaran, li hemû kolanan û di dilên hemû însanan de bûbû dema pêxistina agirê azadiyê.
Her rojên Kurdan Newroz, her Newroz jî roja Kurdan bû. Ew êdî parolaya serhildanê, îşareta hildana seriyan bû.
Berxwedan û çalakiya Mazlum Dogan bûbû sedem ku Newroz li kolanan weke serhildanan were pîrozkirin. Û hetanî roja me wisa hat pîrozkirin.
Îsal, Komîteya Navendî ya PKK'ê di 15'ê Adarê de "Danezana Sala 50'yî" weşand: "Li çar parçeyên Kurdistan û li çar aliyên dinyayê pîrozbahiyên bi coş ên Newrozê çêdibin. Em bawer dikin ku wê ev rewş seranserê salê bidome û hemû roj bibin Newroz. "
Di Newroza 1982'an de, Mazlum Dogan 'Manîfestoya Bendava Çubukê' esas girt çalakî li dar xist. Gelê kurd jî peyama Mazlum Dogan esas girt û qadên Newrozê veguherandin serhildanan. Di sala 50'yî ya Newrozê de jî PKK'ê biryar da peyamên li qadên Newrozê tên dayin divê pratîze bibin û îsal encam bigire. Kurd xwe amade dikin li ser vê esasî, têkoşîna azadî û demokrasiyê pêş bixin. Divê ku sala 50'yî ya Newrozê bi pîrozkirina rojekê sînorkirî nemîne. Her roj li gorî rihê biryarên 49 sal berê li Bendava Çubukê hatin girtin têkoşînek hebe. Di sala 50'yî ya Newrozê de hetanî encam negirin wê ranewestin. Divê ji bo azadiya Rêber Apo, ji bo rûxandina desthilata AKP'ê, ji bo azadiya Kurdistan û demokrasiyê, her roj bi rihê Newrozê têbikoşin.
Di sala 50'yî ya Newrozê de, divê piştgiriyeke mezin ji bo gerîlayên Kurdistanê werin dayin û xwedî derketina li tevgera azadiyê jî esas were girtin.

# Peyama hevpar ya tevgerên Kurdan: Bila Newroz bibe tifaqa navxweyî

**Bi dehan partî, sazî û dezgehên kurdî ji bo Newroza 2022'yan daxuyaniyeke hevpar dan û gotin "Bila Newroza sala 2022'yan, bibe çepera yekîtî û tifaqa navxweyî. Dem dema serkeftinê ye.**

Ji bo Yekitiya Neteweyî

Bi dehan partiyên siyasî, sazî û dezgeh û rêxistinên civakî ji bo Newroza îsal daxuyaniyeke hevpar ya nivîskî dan.
**Daxuyaniya hevpar wiha wiha ye:**
"Di dîroka Kurdistanê de, berî 2634 sal berê bi serhildana Kawayê Hesinker, zordestî û zilma Dahakê tê bidawîkirin û li ser çiyayên Kurdıstanê agirê azadiyê tê hilkirin û geşkirin. Ji wê rojê heta îro di nav gelên Kurdistanê de Newroz wekî cejna azadî, rizgarî, berxwedan û serhildanê hatiye pênasekirin. Kurdistanî û bi taybetî gelê Kurd her sal roja 21'ê  Adarê cejna Newrozê pîroz dikin û vê rojê agirê Newrozê berz dikin. Ji ber vê egerê li cem Kurdistaniyan, Newroz bûye roja berxedanê, roja serkevtina, roja rizgarî û azadiyê.
Newroz li ser bingehê têkoşîna li dijî bindestîyê pêk hatîye. Newroz li dijî zulmê, koletîyê, dagirkerîyê, kolonyalîzmê û bindestîyê bûye sembola rizgarî û azadîyê. Li dijî faşîzma dewleta Tirk Kawayê hemdem Mazlûm Doğan roja 21'ê Adara 1982'an de bi sê darikên Kifrîtê bejna xwe kir agirê azadî û berxwedanê. Ala Kawayê Hesinker, ala azadiyê li paytexta Kurdistanê, li birca Amedê daleqand û agir geştir kir. Ev agir li seranserê Kurdistanê li serê çiyayan, li zozanan, li gund û bajaran geş bû. Îro jî hemû Kurdistanî vî agirê azadiyê li seranserê Ewropa, li parzemînên Emerika, Esya û Ewistralyayê dane geşkirin û wê di vê Newroza sala 2022'an de jî ev agirê azadî, serhildan û berxwedanê ji alî partiyên siyasî, rexıstinên sivîl û pêkkhateyê gelê Kurd ve li heman parzemînan bê geşkirin.
Îro gelê Kurd, li her çar parçeyên Kurdistanê Newroz kirine şahîyeke mezina gelêrî û roja azadî, rizgarî û berxwedanê. Gelê Kurd, dîsa Cejna Newrozê li seranserê Kurdistanê û li hemû parzemînên Cîhanê herwekî naveroka wê ya dîrokî bi armanca rizgarî û azadîyê bi coşeke mezin pîroz dikin. Gelê Kurd, bi têkoşîna xwe ya bê hempa, li serê çiyayan li gundan, li bajaran, li zîndanan, li her cih û warê jîyanê Cejna Newroz kirine çeperê têkoşîna rizgarî û azadîyê.
Îro li seranserê Kurdistanê agirê Newrozê gurtir û geştir e. Li Başûr û Rojavayê Kurdistanê bi rengekî fermî tê pîroz kirin. Li Rojhilat û Bakurê Kurdistanê jî di gel hemû astengiyên dagirkeran, bi wateya xwe ya dîrokî tê pîrozkirin û agirê rizgarî û azadiyê gurtir tê hilkirin û geşkirin.
Em hemû partiyên siyasî, rêkxiraw û dezgehên Kurdistanî, bi vê bîr û bawerîyê, Newroza hemû Kurd û Kurdistanîyan bi dilgermîya neteweyî û niştimanî pîroz dikin. Bila Newroza vê salê, ya sala 2022'yan bibe çepera yêkîtî û tifaqa navxweyiyê. Dem dema serkeftinê ye.
Newroz pîroz be."



# PKK Newroz e Rêber Apo jî Kawayê Hemdem e

**Dehakê serdemê faşîzma AKPê û MHPê ye. Bi saya gerîlayên APOYî, Kawayên Hemdem xwestek û daxwaziyên faşîzmê têk diçin û wê bibe sedema hilweşîna desthilatdariya wan.**

**Mihemed Xanim-Qamişlo**

Beriya Bûyînê sala 612'an, dema fikrên girîng ku di çemên dîrokê de ber bi xaka Mezopotamya ve diherikîn, xwe berdidan nav dilê mirovayiyê. Lê çemekî ji wan çeman jî hebû ku yên weke Dehak û Nemrûdan berhem û hebûna mirovayiyê, biratiya gelan bi rengekî hovane, bi hişemendiyeke faşîst dixistin dewrê û mirov dikare bibêje ku tovê faşîzmê di dema Dehakan de hatiye çandin. Dema mirov dîroka gelê Kurd û serpêhatiyên wê bide ber çavan, wê bibîne ku derketina Kawayê Hesinkar navnîşana çemê dîrokê ye, yê ku li ser erdnîgeriya Mezopotamyayê jiyanekî hevbeş dide avakirin û koka vê yekê jî di kurayiya dîrokê de veşartî ye.

**Berxwedan afirandin e, Nûjenkirin e, xwebûn e.**

Di dîroka mirovayiyê de du çem diherikin; yek çemê heqîqetê ye û yê din jî çemê faşîzmê ye. Kawayê Heesinkar jî mîna çemê heqîqetê ku di dîrokê de ji bo biratiya gelan, neteweya xwe parast û ji bo wekheviyê serî hildaye. Eger mirov rewşa Rojhilata Navî û serdema ku tê de jiyayî bi lêv bikin, bikevin kûrayiya dîrokê de, wê rastiya hişmendiya faşîzan nas bike. Eger em wek fîkrên Rêber APO, Tevgera Azadiyê û Rojhilata Navî ji bo serdema xwe Newrozê binirxînin, emê bigihîjin rastiya wê. Di dîroka Tevgera Azadiyê de, hesinê Kawa bi cûreyekî hemdem ku li beramberî Dehakên serdemê radike, Şehîd Mezlûm Doğan'e. Di şexsê wî de, bi sedan Kawayên Hemdem bi fikir û ramanê tevna mêjiyên xwe, jiyan honan û li hemberî dagîrkeriyê berxwedana asta herî jor de pêş xistin. Ev



yek jî heqîqeta Têkoşîna Azadiyê ye. Rê û resmên ku bi ramanên Rêber APO hatine avakirin, wateya berxwedanê mezintir dibe.

**Jina Kurd xweşkbûna jiyanê honaye û çerxa qirkirinê dişkîne**

Her pêvajoyek li gorî serdema xwe tê biwatekirin û xemilandin. Tevgera Azadiya gelê Kurd, jiyan afirandiye, bi xemil û coş kiriye, kevirê goşeyên jiyanê li ser hev rêz kirine. Yê ku xweşikbûna jiyanê honaye û bi wate kiriye jina Kurd e. Jina Kurd di nava ramanên berxwedanê de hîn zêdetir bi wate dibe û li gorî cîh û demê çerxa qirkirinê dişkîn e. Dehakên serdemê dixwestin ku bi rêbazên cûda vîna gelê Kurd tine bikin û bi taybet jî di nava vê de vîna jinê ya pîroz tine bikin. Têgeha pîroz bixwe jî avakirin e û hevpêymana jiyana hevbeş e. Ji ber wê watebûna Newrozê di Têkoşîna Azadiyê de bi xwe hisandina Kurdperwerî ye, welatperwerî ye, nirxdana jiyanê ye. Em dikarin bibêjin ku êdî girîngiya Newrozê di Kurdisatanê de gihîşte asta herî bilind. Ji ber wê jî pîrozkirina Newrozê ya vê demê bi berxwedaniya keç û xortên Kurd cûdatir bûye.
Newroz ji bo gelê Kurd hêviya jiyaneke nû ye.

Li hemberî tarîtiyê, Newroz hûnandina jiyaneke nû ye. Bêguman di Kurdan de, ji Zerdeşt bigre heta despêka têkoşîna azadiyê de, li beramberî tarîtiyê, ronayî hatiye pijrandin û li hemberî bêbextî û qirqirinê jî berxwedanî hatiye hilbijartin.
Erdnîgariya em li ser dijîn hem jî bi taybetî Mezopotamya ji bo pirtûkên pîroz bûne xwedî war, xeml û bedewiya wî li vê derê havêynê xwe girtiye û herî zêde pirtûkên pîroz li ser vê erdnîgariyê hatine nivîsandin, dîsa herî zêde bawerî û hêvî li ser vê erdnîgariyê hatine afirandin, fîlozofên hêja yên wekî pêxemberê gelê Kurd Zerdûşt jî li ser vê erdnîgariyê bûye. Ji bo vê agir ji bo Gelê Kurd wekî navnîşana ronayiyê ye. Em dikarin bibêjin ev erdnîgariya ku bihişta mirovan e, Dehaq jî dixwazin bikin dojehên mirovan.

**Kawayên Hemdem xwestek û daxwaziyên faşîzmê têk dibin**

Herikbariya dîrokê ya ku heta roja me ya îro hatiye, bi berxwedaniya ku îro li çar perçeyên Kurdistanê dimeşe û ji bo mirovayiyê bûye hêviyeke nû, bûye hêviya jiyanê ku gel bikaribin xwe lê bigrin, bi taybet gelê bindest li ber ronayiya vê têkoşînê, li ber berxwedaniya wî, li ber jiyana bi ramanên azadiyê hatiye hûnandin ku bikaribin xwe rêxistin bikin pêla berxwedaniyê her diçe bilind dibe. Dehaqê di dîrokê de û yê niha ti cudayia wan tine ye . Ji bo bikaribin Newrozê li gelê Kurd tarî bikin, agirê Newrozê ku li serê çiyayên Kurdistanê geş dibe vemrînin, li her derê êrîş dikin. lê her serdema ku Dehaq lê hebin, wê li kêleka wê Kawayên hemdemî jî hebin. Kawayên hemdemî yên serdemê, gerîlayên azadiyê ne. Çerxa faşîzma ku niha li serê hemû cîhanê bûye bela, Dewleta tirkî ye. Perçeyekî mezin ya Dehaqên vê demê jî, Kurdên xwefiroşin ku ji çanda xwe dûr ketine, bûne xwînmijê gelê xwe. Heviyên dagîekeran jî bi vana ve girêdayî ne. Di roja îro de, têkoşîna Azadiyê bersivê dide Dehaqan. Berxwedaniya Rêber APO ya ku di zindana Îmraliyê de li dijî dijmin di her kêliyê de dimeşîne; wekî derba Kawayê Hesinkar yê ku li Deheqan daye ye. Tû ferqa xwe nîn e. Dehaqên serdemê faşîzma AKP- MHP 'ye û Kawayê serdemê jî Rêber APO ye. Niha gelên azadîxwaz hemû xwe li ber fikrê Rêber APO ronî dikin. Ji ber vê tecrîda li ser Serokatî qebûl nakin. Her wiha bi saya gerîlayên APOYî, Kawayên Hemdem xwestek û daxwazên faşîzmê têk dibin. Wê ev yek jî bibe sedema hilweşandina.

# PKK parêzvana rastiya Newrozê ye

**Serbest Etê-Qamişlo**

**Newroz cejin û peyama dîrokî ya berxwedan, serhildan û azadiyê gelê Kurd e. Li hemberî Dehakên Serdemê, ev 50 sal in ji bo gelan her roj Newroz e.**

**Newroz mîrate û nasnameya çanda Mîtra ye**

Roja 21`ê Adarê ango Cejna Newrozê, ku şev û roj tê de dibin weke hew, Kurdan ne bi efsaneya Kawayê Hesinkar tenê ev roj wek cejin nas kiriye, ji Hurîyan heta Medan, ew roj her tim weke cejna Mîtra dihat pîrozikirin. Mîtra ne xwedawenda ronahiyê û bawariyeke tenê bû, di heman demê de nasnameyeke çandî ya gelê Kurd bû. Ji ber wê gelên Mezopotamya, bi taybetî gelê Kurd vê rojê, destpêka salê û jinûve zindîbûn û hilberîna xwezayê, bereketa Xweda ya bi ser erdê dibare, dibînin û bi pêxistina agir li serê çiyayan û gerandina şahî û dîlanan, pîroz dikirin.

**Newroz peyameke dîrokî ya gelên Rojhilata Navî ye**

Jixwe Newroz li Rojhilata Navî ji aliyê gelê Kurd, Fars, Tacîk, Efxan, Beloc û Azerî ve wek roja pêxistina agir tê zanîn û her netewe li gorî çanda xwe bi şêwazên cuda wek cejn û peyameke hevbeş pîroz dikin. Lê pirtir gelê Kurd ji wê serdemê heta roja me ya îro li nasname û mîrateya xwe ya çandî, xwedî derketiye. Bi pêşketina sîstema desthilatdariyê ya Qralê bi navê Dehak jî gelê Kurd bi pêşengiya efsaneya



Kawayê Hesinkar kir cejna berxwedan, azadî serkeftina bindestan û zilmgeha ava kirî hilweşand û azadî bi dest xist.

**Dehakên serdemê nikarîn vê rastiyê tine bikin**

Sîstema desthilatdar Dewlet-Netewe (Dehakên serdemê) êrişên qirkirina fîzîkî û çandî ya li hemberî gelan bi taybetî gelê Kurd dijwartir kirin. Di nava sed salên dawiyê de di nava Kurdan de Newroz êdî wek cejneke ku Kawayê Hesinkar li dijî zilma Dahak bi ser ketibû tenê dihat pîrozkirin. Ji ber wê ti reng û wateya wê ya serîrakirinê nehiştibûn. Ev li her çar parçeyên Kurdistanê bi taybetî li bakurê Kurdistanê bi perçiqandina gelê Kurd û çanda wî pêk dihat. Lê tevî ewqas êrişên hovane, Dehakan nikarî mîrate û rastiya çanda gelê Kurd ya berxwedan û azadîxwaziyê tine bikin.

**Ev 50 sal in, her roj Newroz e**

Rêber Apo di lêgerîna Heqîqetê de, Newroza sala 1973`yan li bendava Çubuk ya Enqere civîna pêşî ya Tevgera Azadiyê di gel çend şoreşgeran li dar dixin. Bi gotina `Kurdistan Mêtinger e` pêvajoyeke nû ya dîroka Kurdan ya azadî û berxwedanê jinûve dest pê dike û Newroz ji cejna şahiyê veguherî cejna azadî, berxwedan û serhildanê ya li dijî zilmê.
Li ser vî bingehî efsaneya Kawayê Hesinkar ji aliyê pêşeng û mîlitanên PKK`ê ve zivirî rastiya berbiçav. Ji ber wê Newroza sala 1982`yan ji pêşengên PKK'ê Mazlûm Dogan li girtîgeha Amedê bi slogana `Berxwedan Jiyan e` li hemberî zilma Dehakên serdemê ango dewleta tirkî ya faşîst, agir bi canê xwe xist û Newroz pîroz kir. Bi agirê bedana xwe jî bû Kawayê Hemdem û xwediyê meşeleya venemirî ya Newrozê.
Bi Tevgera Azadiya Apoyî, herwisa agirê Newrozê ji aliyê jinên Kurd ve li dijî zilmê hat pêxistin. Jinên Apoyî di Newrozan de bi bedenên xwe agirê azadiyê pê xistin û wateyeke cuda dan cejna berxwedanê. Jinên serhildêr mîna Zekiye Alkan Newroza 1992`yan li ser Sûrên Amedê, Rahşan Demîrel Newroza 1992`yan li Îzmîrê, Bedriya Yildiz (Ronahî) û Nilgûn Yildirim (Bêrîvan) Newroza 1994`an li bajarê Manhîmê yê Almanya, bedenên xwe kirin meşeleya azadiya gelê xwe. Ji ber wê Rêber Apo li ser van jinên serhildêr ev got: "Eger azadî tiştekî hêsan bûya wê Zekiye, Ronahî û Bêrîvanê bedenên xwe nedana agir. Jinên Kurd êdî jiyana azad nas dikin."
Herwiha Sema Yuce bi çalakiya xwe dîrok nivîsand ku 21`ê Adara 1998`an li girtîgeha Çankale pêk anî û 17`ê hezîrana 1998`an tevlî karwanê nemiran bû. Sema di nameya nivîsî de çalakiya xwe bi van gotinan vegot: "Ez dixwazim mejî, dil û bedena xwe ji 8`ê Adarê heta 21`ê Adarê bikim pirek ji agir. Ez dixwazim bibim şagirteke jîr ya Kawayê Hemdem û wek Zekiye bişewitim, weke Rahşanê bibim Newroz!"
Her çenda Newroz û dîroka Kurdan de bi efsaneya Kawayê Hesinkar tê nasîn, lê efsane û mîtolojiya rastiya berxwedana Kurdan ya hezarên salan li dijî zor û desthilatiya ji destpêka dîrokê ve nîşan dide. Ya vê efsaneyê dizivirîne rastiyên ebedî jî ew e ku bi hezaran neviyên Kawayê Hesinkar li hemberî Dehakên serdemê (Desthilatiya nû ya Modernîteya Kapîtalîst) ji bo azadiya gelan têdikoşin. Meşeleya Agirê Newrozê ya berî 2.634 salan hatî pêxistin, îro heman meşele di destê gerîlayên Azadiyê de ye û li serê çiyayên Zagros û Turosan dîlana Azadiyê digerînin. Ji ber ku ev 50 sal in Rêbertiyê agirê Newrozê di dilê her Kurdî de geş kiriye; ev 50 sal in gelê Kurd ji bo azadiya xwe û ya gelên Rojhilata Navî bi coşeke mezin wek lehiyan diherike qadên Newrozê; ev 50 sal in ji bo azadî, berxwedan

## Fener…..

### Wê jinûve bêhna bêrînê bifûre



**Idrîs Henan**

Di koşeyeke teng de û bi dizî ez girtim û lome li min kirin! Jixwe nikarim wê kêliyê ji bîr bikim. Her çendî min xwe bi boyaxa ziwabûyî ya ji kevirên dîwarê koşeya min diweşiya, dipêça, stûyê xwe dirêj dikirin û bi xunava ji rûyê wan diherikî li çavên min dinihêrîn. Nediaxivîn. Tenê bizav û lebitîna min a tewşankî mêze dikirin û ez dixistim bin venirîna puxteyên xwe.
Wisan nêzîkatiyên di navbera me de ne ji rêzê bûn. Ne wan û ne jî min bawer dikir ku rojekê emê bi vî rengî rûbirûyî hev bin. Qet nedihat bala me jî ku em ê rojekê bi vî awayî ji hev cuda bibin! Me yeqîn nedikir rojekê di ezmûnek wisa re derbas bibin. Her çendî ji me re hatibe gotin jî lê me bawer nedikir ku neyarê me ewqas dermirov û bêexlaq be. Rastî ew e ku pêwîst e kînên me ji hovîtiya dijmin mezintir bin ku dirindetiya wî têk bibin. Lazim e êş û azarên me weke dilopên intîqamê ji ber lêvên me biherikin û weke pêçekan li dora dest, ling û qirika celadan bigerin.
Hilqetandin û qirkirina me ne rûdanek metaforîk bû. Berovajî, pratîk û kiryarek zindî ya sedsalê bû. Koma kulîlkên di saheya hewşa mala me de hewl didan wê rastiyê vebêjin. Realîteya cewherê neyarê bav û kalan her wextên sedsalê derbasdar e ku naveroka wî kuştin, qirkirin û inkar e. Dijminê me bê kultur e, sînorên saw û nîgaşên wî yên dijatiya ji estetîk û resentiyê re nîne. Ji lewra çiqas tu bibêjî jî hov û ne mirov e.
Rê tinebû ku bibin rêhevalên koça min a ber bi asoyên wendahiyê. Ne gengaz bû. Me bixwesta jî, derfet tinebûn. Nayê bîra min me xatir jî ji hev xwestibe. Berovajî, me soza xwe bi xwîna ku di cihokên cadan û qelîştokên çiyayan re diherikîn de mohr kir. Di heman koşeyê de, bi dizî û bi pistepistan, bi dîdariya kevirên koşeya boyax weşyayî sozên me dihatin piştrastkirin. Em bawer bûn ku çiqas dûr be wê vegera me nêzîktir be. Em ê di bin wî barî de nemînin ku rojekê stûyê me li ber zarokên me xwar be. Em ê bi qasî bilindahî û perweriya kêlikên goristanên Metîna û Qaziqlî dilsozê vegerek bi rûmet û serfiraz bin.
Me berê xwe da hembêza çiyayê Lêlûn û li ser pişta me mala me barkirî bû. Çendîn qirecira balefirên cengê namûsa asîmanan diçirand, lê dîsa jî li ber awazên serkeftina şervanên me nedihatin bihîstin. Li ber wijdanê bedenên parçebûyî û cesedên hûrhûrîbûyî guh kerr û ziman lal bûn. Belê; şervanên me bi ser ketin. Em bi zorê hatin derbiderkirin, lê ji ber serkeftina me bû. Dibe jî kulîlkên me di nav dest û piyan de mabin, lê ti carî di hembêza genî ya dagirkeriyê de hişîn nabin û ne jî bêhna wan difûre.
Destên ku çar sal in li ber asoyê hilmaştî ne û lavayên vegerê dikin, tiliyên ku li ser têltîkê hişkbûyî, zengilokên ku qêrîna azadiyê têde asê mayî, xeyal û sozên bi xumava cihokên herikyayî mohrkirî, piştî çar salan jinûve peymana xwe bi kulîlkên roniya jiyanê re nûjen dikin. Awirên ku nalerizin û bi lûtkeyên Hawar. Lêlûn û Çayê Gewr re bûne yek, qet rê nadin ku kulîlkên xalîçeya azadiyê biçelmisin û ne jî serî li ber ba û tofana beredayî diçemînin. Dê wefdarê rehên dar û daristanên xwe bin û dê jinûve bêhna bêrînê bi ser Efrînê de biforînin.